**_Kongra Netewiya Kurdistan_**
_Kurdistan National Congress_
**_Congrès National du Kurdistan_**

KNK

**_Rue Jean Stas 41   1060  Bruxelles  tel: 00 32 2 647 30 84   fax: 00 32 2 647 68 49_**
**_Homepage:_** www.kongrakurdistan.com   **_e-mail:_** knk@kongrakurdistan.com

# Ji bo raya giştî

Bruxelles, 11.08.2003

Serokê rûmetê yê KNKê birêz Abdullah Öcalan, di hevdîtinên dawî de ji parêzerên xwe re, problemên tenduristiya xwe cara yekemîn e ku bi awayekî ciddî tîne ziman û ji wan bi îsrar dixwaze ku li ser tenduristiya wî bisekinin.

Birêz Öcalan eva çar sal û nîv e ku di destê Dewleta Tirk de dîl e. Di vê demê de hîç wextek tenduristiya xwe dernexist pêş rewşa siyasî. Lê belê vê carê bi îsrar ji bo rewşa tenduristiya xwe hişyarî dike. Em wek Kongra  Netewiya Kurdistan ji ber tenduristiya birêz Öcalan nîgaran in.

Li ser navê Konseya Rêveber ji berpirsyarên Dewleta Tirk re bang dikin : Tenduristiya birêz Öcalan, tenduristiya Gelê Kurd e. Eger ji bo tenduristiya gelê me xeter çêbe, eva tê wê wateyê ku tenduristiya Tirkiyê jî ê di bin xetereke mezin de bimîne.

Birêz Öcalan mifta aştî, demokrasî û îstîkrara Tirkiyê ye. Pêwîste berpirsyarên Tirkiyê gor vê rastiyê nêzîkî birêz Öcalan bibin,  ji bo parastin û tedaviya wî çi pêwîste pêk bînin û di derbarê tenduristiya wî de, Gelê Kurd û raya giştî di demeke nêzîk de agahdar bikin.

Konseya Rêveber ji gelê me re jî bang dike ku Ji bo tenduristiya serokê netewî birêz Abdullah Öcalan hişyar û amade bin.

Berdevk (Gotebêj) ê Konseya Rêveber
Remzî Kartal